

## KADİM HİKMET DERGİSİ

Uluslararası Sosyal Bilimler Dergisi



Kadim Hikmet, 5 (2021), 102-120  
Araştırma Makalesi/Research Article

### Yayın Süreci:

Geliş/Received: 11.11.2021

Kabul/Accepted: 18.11.2021

### KOVAR, ZIMAN Ê PERWERDE -KOVARA NÛBIHARÊ Ê ZIMANÊ KURDÎ-

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN  
Zanîngeha Mardin Artukluyê, Fakulteya Edebîyatê  
Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî  
tahirhan@hotmail.com  
ORCID: 0000-0002-2586-2956

#### Puxte

Kovar di warê zanistê da xwedî bandoreka giring in. *Kovara Nûbiharê* cara ewil di sala 1992yan hate weşandin. Armancên kovaran curbicur in. Yek ji van armancan jî hînkirin û bipêşvebirina ziman e. Ev mijara ewil, bi taybetî di derbareyê perwerdeya ziman da ye. Em di vê gotarê da li ser bandora *Kovara Nûbiharê* a li ser zimanê kurdî rawestîyan. Ji nivîsan jî tê famkirin ku armanca ewil a derketina *Kovara Nûbiharê* xizmeta ziman û nasnameya kurdî ye. Ji bo vê armancê heta îro 156 hejmarên kovarê derketine. Kovar bi taybetî giringîyeka mezin dide hînbûn û hînkirina zimanê kurdî. Ji ber vê yekê, di hejmarên xwe yê destpêkê da, bi taybetî li ser mijarên zimanê yê wekî alfabe, rêziman, ferheng û mafê zimanê dayikê rawestîyaye. Îro jî *Nûbihar*, zimanê kurdî wek dîyardeya herî giring a nasnameya kurdî dibîne.

**Peyvên Sereke:** Kovara Nûbiharê, zimanê kurdî, perwerde, nasname

### MAGAZINE, LANGUAGE AND EDUCATION-NUBIHAR MAGAZINE AND KURT LANGUAGE

#### Abstract

*Journal, Language and Education -Journal of Nubihar and Kurdish Language-*

Journals have a significant impact in the field of science. *Journal of Nubihar* was first published in 1992. Journals have various purposes. One of these purposes is to teach the language and develop it. This first topic is particularly relevant to the field of language teaching. In this article, we focused on the influence of *Journal of Nubihar* on the Kurdish

Language. As can be understood from the articles, the primary aim of *Journal of Nubihar* is to serve the Kurdish language and identity. For this purpose, 156 issues of the journal have been published so far. The journal attaches great importance to the learning and teaching of the Kurdish Language. Therefore, in its first issues, it focused on language topics such as the alphabet, grammar, dictionary and the mother tongue right. Even today, *Nubihar* sees the Kurdish language as the most distinctive indicator of Kurdish identity.

**Keywords:** *Journal of Nubihar*, Kurdish Language, education, identity

## Destpêk

Di vê lêkolînê da em ji alîyê perwerdeya ziman ve Kovara *Nûbiharê* dinirxînin. *Nûbihar* kovareka çawa ye û ji bo çi derketîye? *Nûbiharê* ji bo zimanê kurdî çi kirîye? Di derheqê alfabe, rêziman, rastnivîsîn û hwd çi pêşkêş kirîye? Di derheqê mafê ziman da *Nûbihar* çi difikire? Ji bo ku bala mixateb û xwînerên xwe bikişîne li ser kurdî, nivîsîna bi kurdî û xwendina kurdî kîjan çalakîyan domandîye? *Nûbiharê* têkilîya ziman û nasnameyê bi çi awayî anîye ziman? Di avakirin û domandina nasnameyekê da rola ziman çawa derxistîye pêş? Em di vê lêkolînê da li ser van xalan sekinîn.

## 1. KOVARA NÛBIHARÊ

### 1.1. Bihara zimanê kurdî

Li ser berga hejmara yekemîn a Kovara *Nûbiharê* “Mehnameya Çand û Huner û Edebîyat”<sup>1</sup> dinivîse. Di heman hejmarê da serenava nivîsa Pêşgotinê jî “Di payîzê de nûbihar”<sup>2</sup> e. *Nûbihar* xwe wekî rengvedana çand, huner, ziman, edebîyat, dîn û berxwedana gelekî dide nasîn. Ev gel, gelê kurd e. Kedkarên kovarê, vê mizgînîyê di hejmara 5an a sala 1993yan da, di bin serenava “Li zimanê xwe, li kovar û kitêbên xwe xwedî derkevin!”ê da li ser navê kovarê weha tînin ziman: “*Heval û hogirên hêja! Îro vaye, ji Xweda re şukir, ji bona me kurdan dewreke nû destpêkiriye. Ko em bikaribin ji vê firsendê baş îstîfade bikin, dibe ku halê me mazluman bibedile, ronesansa Kurdan ji nû ve destpêbike û Selahedîn ên nû, Mela Ehmedê Cizîrî yên nû, Ehmedê Xanî yên nû, Şêx Seîd ên nû, Seyîd Riza û hwd ên nû derkevîne holê. Xuşk û birayên hêja! Werin em hemu, wezîfa ku li para me dikeve, em pêk bînin...*”<sup>3</sup>

<sup>1</sup> Bnr. *Nûbihar Mehnameya Çand û Huner û Edebîyat*, h. 1, sal 1, Stenbol 1993; Piştî demekê navê kovarê weha hatiye guherandin: *Nûbihar Kovara Çandî Hunerî Edebî*.

<sup>2</sup> Bnr. *Nûbihar*, h. 1, r. 3.

<sup>3</sup> “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 5, Stenbol, 1992, r. 3; **Me bi gelemperî, şaşî û cudahîyên rêzimanî, devokî û rastnivîsînê yên di jêgirtinên rasterast de guherîn û serrastkirin çê nekirine.**

Bêgûman berîya *Nûbiharê* jî kovarên xweru kurdî derketine. Lê taybetmendîya *Nûbiharê* ew e ku digel kurdîbûna xwe Îslamî ye jî. Her çiqas em îro kovarên bi vî rengî jî dibînin, di wextê xwe da mînakeka wekî *Nûbiharê* tunebûye. Wekî din *Nûbihar* di serdemeka wisa da dest pê kirîye ku zimanê kurdî gelek astengîyên qanûnî, civakî, aborî û hwd dîtine ku ew bixwe jî vê serdemê wekî “payîz”<sup>4</sup> bi nav dike.

## 1.2. Mijarên Kovara *Nûbiharê*

*Nûbihar* ji Çirîya Pêşin a 1992yan heta rojame îro, tam bîst û neh sal in xwe, bêyî navber, bi ezîmkarane, bi israr weşana xwe domandîye.<sup>5</sup> Ji roja derketîye heta 2002yan mehane derketîye û ji wir pê ve jî ji sê mehan carekê derketîye. Heta dawîya sala 2021ê 156 hejmar hatine weşandin. Her hejmareka kovarê bi mijarên xwe yê cûrbicûr bûye xezîneya çand û zimanê kurdî. Mirov dikare bibêje hema di jîyana kurdan da çî hebûye di kovarê da jî çihê xwe girtîye: çand û hunera kurdan, hevpeyvînên li ser pirsgerêka kurdan, heyat û kurtejiyana alim, zana û lehengên kurdan, nivîsên li ser azadîyê, helbestên kurdî yê nûjen û klasîk, nivîs û helbestên wergerandî ji zimanên wekî farisî, erebî, tirkî, fransî, îngilîzî, almanî û hwd, çîrok, zarokname, karîkatûr, felsefe, pirsgerêkên zimanê kurdî, danasîna pirtûk û kovaran, nameyên xwendekaran, gotinên pêşîyan, biwêj, dîroka kurdan, rêzimana kurdî, alfabeya kurdî, sîyaset, ceribandîna fikrî û yê edebî, panelên li ser kurdan û zimanê wan, daxuyanîyên sempozyûm, komxebat û civînên zanistî, daxuyanîyên pêşbazîyan, wateya ayetên Qur’ana pîroz, hedîsên hz. Pêxember (sxl), sîyera nebî, jîyannameya sehabîyan, tefsîra ayetên Qur’anê, mijarên dînî û fiqhî, pirsgerêkên erdnîgarîya Îslamê, ji destpêkê heta îro pirsê kurdî, sîyaseta cîhanê, pirsê jinê, çapemenî û weşanên kurdî, rojên pîroz, pêkenok, analîzên civakî û derûnnasî û hwd.

## 1.3. Kovara *Nûbiharê* çima derket?

Em dikarin bersiva vê pirsê bi hêsanî û bi zelalî di Kovara *Nûbiharê* bixwe da bibînin. Ev pirs gelek caran ji perpîrs û kedkarên kovarê hatîye kirin. Wekî mînak heftenameya Azadî di hevpeyvîna xwe ya ku bi Sabah Kara re pêk anîye da, dipirse û dibêje: “*Nûbihar çima derket; fikr û raya wê ya weşandinê çî ye?*” Kara di bersiva xwe da dibêje ku *Nûbihar* xwedî fonksîyoneka mezin e ku ev fonksîyon, ji îdeolojîyan berfirehtir e. Li gorî Kara, ji bo îdeolojîyê (ji bo teblîxa Îslamê) zimanê kurdî tercîheka rast û maqûl naxuye. Lewra hem kurdî ji bo temsîliyeta îfadekirina dîn û îdeolojîyekê, astengdar dixuyê, hem jî jixwe li hemberî vî zimanî gelek astengîyên dijwar hene. Eger nîyeta kovarê tenê teblîxa Îslamê bûya dê ji bo vê

<sup>4</sup> “Pêşgotin”, *Nûbihar*, h. 1, r. 3.

<sup>5</sup> Li gorî sala 2021ê.

yekê zimanê tirkî tercîh bikira ku mirov dikare bi mîlyonan pirtûk û weşan bi vî zimanî bibîne. Lê çawa ku dixuye, sedema kovarê tenê ne belavkirina dîn û îdeolojîyek e.<sup>6</sup> “*Naxwe armanca eslî ya Nûbiharê çi ye? Armanca eslî ya Nûbiharê ew e ku zimanê kurdî bigihe wê merhaleyê ku kurd bikaribin xwe bi vî zimanî îfade bikin. Em dixwezî ku em kurdî bigihînin wê sewiyê ku tê de mefhûmên nûjen û muasir, term û istilahên werin bikaranîn û em kêmasiyên nesra kurdî kêmbikin; û îlavê li vê xebatê, em dixwezî ser îdeolojîyê jî bisekinin. Yanê îdeolojî piştî van e. Armanca eslî ya Nûbiharê ev e ku kurdî bibe zimanê nûjen û muasir.*”<sup>7</sup>

Xwînerêkî *Nûbiharê* rexne li kovarê dike û dibêje ku kovar di şûna mijarên ramanî û îrşadê de, bêtir li ser pêşvebirina zimanê kurdî disekine. *Nûbihar* jî di bersiva xwe da tesbîta xwînerê xwe rast dibîne û dibêje ku ji fikr û îdeolojîyê zêdetir li ser ziman disekine. Lewra eger nîyeta kovarê, tenê teblîxa îdeolojîyekê bûya dê weşana xwe bi zimanekî hêsantir û berbelavtir bikira. Lêbelê kovar dixwaze ku zimanê kurdî bi pêş bixe da ku di demeka nêzik da ev gelê kurd bikare di her aliyên jîyana xwe da ji vî zimanî îstîfade bike.<sup>8</sup>

## 2. NÛBIHAR Û MAFÊ ZIMAN

### 2.1. Çima ziman?

Weki tê dîtin di derxistina kovara *Nûbiharê* da ziman roleka sereke lîstîye. Em ji van hevokên jêrîn jî vê xalê bi zelalî dikarin bibînin: “*Axaftin, xwendin û nivîsîna bi zimanê zikmakî, ji her mirovî re pêwistiyek e. Çawa ku dar bê kok nabin û li ser kokê xwe şîn dibin, mirov jî nikarin bê ziman bin û ew jî li ser zimanê xwe şîn tînin. Erê, peywendîya dar û kokê çi be, peywendîya mirov û ziman jî ew e. Çawa dara bê kok nikare şîn be û di cihê xwe de hişk dibe, mirov an gelê bêziman jî nikare bi pêş de bikeve û di cihê xwe de pûç dibe. Lewra mirov bi ziman difikire. Her çi berîya ziman, qeweta fikrê bi şeklê ‘bilquwwe’ di nefsa meriv de mewcûd be jî, pêkhatin û derhatina fikir, bi sayeta ziman e. Naxwe em dîkarin bibêjin ku zimanê meriv çiqas qewî be, fikra meriv jî ewqas qewî dibe. .... ‘Mana’ bi sayeta ziman tete wucûdê. ‘Çêbûn’ û ‘çawabûn’ a her tiştî bi sayeta ziman tete famkirin û îdrak dibe û cardin bi sayeta ziman tete famdan û îdrakdan. ... Ziman ji ciheta nijadî, irsî, enanetî û tarîxî jî pir muhîm e. Nijad, berî her tiştî, ji ciheta ziman ji hevûdu cuda dibin. Lewra xusûsîyeta eslî ya*

<sup>6</sup> Bnr. Sabah Kara, “Misilman gerek e muheqqeq li pirsgirêka kurdan xwedî derkevin”, (Hevpeyvîna heftenameya Azadî), *Nûbihar*, h. 5, İstanbul 1993, r. 23.

<sup>7</sup> Sabah Kara, heman hevpeyvîn, *Nûbihar*, h. 5, r. 23.

<sup>8</sup> “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 4, İstanbul 1993, r. 3-4.

*her nijadî, zimanê wî yê nijadî ye.*"<sup>9</sup> Ev nêrîna hanî di temamê hejmarên kovarê da derdikeve pêş.

## 2.2. Mafê zimanê dayikê

Lî gorî nêrîna *Nûbiharê* di alema mirovahîyê de, tişta ku gelan ji hevûdin vediqetîne û cuda dike zimanê zikmakî ango zimanê dayikê ye. Lewra Xwedê, her gelekî bi zimanekî taybet afirandîye.<sup>10</sup> Li gorî nêrîna *Nûbiharê* hemû zimanên cîhanê ji ayetên Xwedê ne.<sup>11</sup> Jixwe mirov, xêra zimanê dayikê, jî mirovahîya xwe û mensubîyeta gelê xwe fam dike.<sup>12</sup> Li gor *Nûbihar* û xwînerên wê, sebaba afirandina zimanan, ji alîyê Xwedê ve, xwenasîn û hevnasîna digel gelên din e.<sup>13</sup> Ji ber vê yekê zimanî, wekî rehê gelan û parêzgerê çand û hunera wan dibînin.<sup>14</sup> Kovar, hebûna zimanî li ser delîl û nêrînen dînî/îslamî ava dike dibêje ku dînê îslamê tu carî reng û zimanên mirovan înkâr û qedexe nekirîye.<sup>15</sup> "*Tu millet tuneye ku welatê wan mîna yê kurdan parçe parçe bûbe û di her parçeyekî de zilmên dijwar li wî milletî bariyabe.*" Zulmeke mezin li kurdan tê kirin û li gorî îslamê, kesê ko bibêje ez misilman im divê li ber zilmê dengê xwe bike.<sup>16</sup> Divê her gel li hêmanên ku gelbûna wî pêk tîne xwedî derkeve. Lewra "*gelên ku xwedîtî li gewşîn û celebên xwe, li ziman û çanda xwe nekirin, di rûpelên dîrokê de pir in û niha li holê xuya nakin.*"<sup>17</sup>

*Nûbihar*, kurdan wekî berpisyîyarên zimanê kurdî destnîşan dike û barekî giran datîne li ser milên wan. Li gorî *Nûbiharê* divê kurd qîmeta xwendin û nivîsandina bi kurdî bizanin. Ji bo ku kurd li ser lingên xwe bikarin bisekinin, bêguman divê li çand, huner û zimanê xwe xwedî derkevin, zimanê xwe hîn bibin, wî bi pêş ve bibin û ji mafên mirovbûnê para xwe bistînin. Lewra mirov bi van qîmetan dibe millet.<sup>18</sup>

## 2.3. Di *Nûbiharê* da nasname û ziman

*Nûbihar* hebûna nasnameya kurdî bi zimanê wan ve girê dide û bi giştî dibêje, eger zimanê kurdan berdewam be dê kurd jî hebûna xwe bidomînin lê eger zimanê wan winda be yan jî tune be dê ew jî bi xetereya nebûnê ra rûbirû bimînin. Ziman ew taybetmendî ye ku

<sup>9</sup> "Ji çapemeniya kurdî, berpirsîyarê giştî yê kovara me Sabah Kara: "Heger ev ax, ne ax be, lê lat jî be, wê ev dara mezlûmiyetê, wê ev dara tûba, şîn were", *Nûbihar*, h. 14, İstanbul 1993, r. 24-25.

<sup>10</sup> Aqîl Mihacir, "Di serrastkirina rêya mirovan de rola zimanê zikmakî", *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, r. 27.

<sup>11</sup> İbrahim Xelîl Molazade, "Ma İslam zimanê kurdî bîpaşde xist?", *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 11.

<sup>12</sup> Mihacir, heman gotar, h. 21, r. 27.

<sup>13</sup> Molazade, "Ma İslam zimanê kurdî bîpaşde xist?", *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 11.

<sup>14</sup> Mihacir, heman gotar, h. 21, r. 27.

<sup>15</sup> Molazade, "Ma İslam zimanê kurdî bîpaşde xist?", h. 8, r. 11.

<sup>16</sup> Süleyman Çevîk, "Li nav û dengê xwe xwedî derkevin", *Nûbihar*, h. 13, İstanbul 1993, r. 8.

<sup>17</sup> Mihacir, heman gotar, h. 21, r. 28.

<sup>18</sup> Çevîk, heman gotar, h. 13, r. 9.

gelan ji hevûdin vediqetîne. Unsûrên ku xelkekî dikin millet ev in: ziman, çand, huner, orf, kevneşopî û hwd.

Li gorî edîtorê kovarê, Çevîk, kurd ji mêj ve ji xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe mahrûm mane. Zimanê kurdan ji avakirina Komara Tirkîyê heta îro qedexa bûye. Ji ber vê qedexekirinê, ziman nehatîye bikaranîn. Loma jî kurd ji zimanê xwe bê xeber mane û zimanê xwe têra xwe nas nekirine.<sup>19</sup>

*Nûbiharê*, hin hejmarên xwe bi taybetî teksîsê ziman, giringîya ziman û pirsgerêkên ziman kirîye. Di “Destpêk”a hejmara heştan da weha tê gotin: “*Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe! ... Me xwest ku em di vê hejmarê de li ser zimên û grîngiya zimên bisekinin û lizûma axaftin û xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe nîşan bidin... Miletê bêziman, ne ti millet in; hetta ne millet in jî! ... Xusûsiyetek ji xusûsiyetên ku mirovan dike gel, yanî dike millet; ziman e.... Naxwe li zimanê xwe xwedî derkevin. Ko zimanê merev ne ti ziman be jî, gereke merev dev ji zimanê xwe bernede. Lêbelê zimanê me, zimanek ji zimanê dereca ewil e.*”<sup>20</sup>

Sabah Kara, zimanî wekî koka darê dibîne û dibêje çawa ku dar bê kok nabin û li ser kokê xwe şîn dibin, millet jî nikarin bê ziman bin û ew jî li ser zimanê xwe şîn dibin. Kara, pêşveçûna kurdan bi zimanê wan ve girê dide û dibêje heta ku zimanekî qewî dernekeve holê medenîyeteka qewî jî pêk nayê. Lewra mirov bi zimanî difikire.<sup>21</sup> Kara di navbera civakê û zamanî da têkilîyeka xurt dibîne. Li gorî wî weke ku ziman mirovan dike însan, civakan pêk tîne, wisa jî însan û civak jî zimanî pêk tînin. Yanî, tu millet nikare hebûna xwe ya orîjînal bêyî ziman pêk bîne. Ji aliyê din ve ziman jî bi saya civakê bi pêş dikeve.<sup>22</sup>

### 3. NÛBIHAR Û HÎNDEKARÎYA ZIMANÊ KURDÎ

Kovara *Nûbiharê* digel mijarên dîn, çand, sîyaset, edebîyat, kurtejiyan, helbest û hwd giringîyeka mezin daye mijarên zimanî jî. Di vê çarçoveyê da li ser mijarên wekî alfabeya kurdî, rêzimana kurdî, ferhenga bêjeyên bîyanî/dijwar, bêjeyên hevwater û dijwater rawestîyaye:

#### 3.1. Alfabeya kurdî

Mijareka Kovara *Nûbiharê* ya di derheqê ziman da alfabeya kurdî ye. Danasîna alfabeya kurdî, di hejmara duyem da dest pê dike. Di vê hejmarê da alfabeya kurdî bi rêzê ve hatîye

<sup>19</sup> Süleyman Çevîk, “Roj, roja zanebûn û hînbûna bi zimanê xwe ye”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 7.

<sup>20</sup> “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 3.

<sup>21</sup> Kara, “Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe!”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 5.

<sup>22</sup> Kara, heman gotar, r. 6.

dayîn, ji bo her tîpekê mînakê ji bêjeyan digel maneyên wan ên tirkî hatine dayîn. Paşê, tîpên dengdêr û yên dengnedêr, yên girdek û hûrdek, dengdêrên dirêj û kurt hatine nasandin. Ji hejmara heştêm pêve alfabeya kurdî bi tîpên latînî û erebî bi hev ra hatine pêşkêşkirin û herwekî berê, ji bo her tîpekê, bêjeyek digel nivîsandina wê yê erebî, wekî mînak hatine dayîn.

### 3.2. Rêziman

Ji ber ku Kovara *Nûbiharê* xwe wekî dibistana zimanê kurdî dîtîye, ji bo hînkirina ziman çî pêwist e, di xwe da hewandîye. Yek ji van mijarên sereke jî rêzimana kurdî ye. Rêziman ji hejmara duyem dest pê dike. Di vê hejmarê de, maneya kîte, bêje, pevdeng û hejmarê hatîye dayîn. Dîsa di vê nivîsê da hejmare, hejmar û hejmarên rêzê hatine pêşkêşkirin.<sup>23</sup> Lêbelê navê amadekar nehatîye nivîsandin. Di hejmara sisêyan da di bin serenava “Rêzimana Kurdî” da mijarên wekî “hev deng (homonim)”, “hevmana (sinonime)”, “dijraber”, “piçûker” û “zayend”;<sup>24</sup> di hejmara çaran da dîsa di bin serenava “Rêzimana Kurdî” da, mijarên wekî “veqetandek (zêder)”, “pêşkerên hejmarkî” û “tewandina navan û pêşkerên hejmarkî”, hatine dayîn.<sup>25</sup> Mijarên ziman, rêziman, alfabe û rastnivîsînê gavbigav hatine dayîn. Lê piştî hejmara çaran em babetên rêzimanê nabînin.

### 3.3. Ferheng

Wekî ku tê dîtin kovarê, xwe wekî berpirseka hîndekarîya zimanê kurdî jî qebûl kirîye. Ji ber vê yekê, ew, xwînerên xwe jî wekî xwendekarên kurdî qebûl dike. Loma jî bi alfabeyê dest pê dike, rêzimana kurmançî dide û metin, helbest û hevpeyvînan pêşkêş dike. Digel vê jî, ji bo peyvan jî di hin hejmaran da ferhengokên biçûk amade kirîye. Kovar di amadekirina ferhengokan da xwînerên xwe wekî tirkîzan dihesibîne. Ji ber vê jî tirkîya bêjeyên bîyanî yên di hejmarê da dide. Wekî mînak, di hejmara yekem<sup>26</sup> da wateya 114 bêjeyan, di hejmara diduyan<sup>27</sup> da wateya 193 bêjeyan, di hejmara sisêyan<sup>28</sup> da wateya 93 bêjeyan hatîye dayîn. Lê di hejmara çaran<sup>29</sup> da rêbaza ferhengê hatîye guherandin. Li vir, ferhenga bêjeyên di navbera “a-adeseyê” da ji aliyê Rojîn Zelal ve li bin serenava “Ferhenga Kurdî-Tirkî (1)”, alfabetîk hatîye amadekirin û wateya 55 bêjeyan hatîye dayîn. Lê dîsa piştê vê hejmarê, rêbaza kevin

<sup>23</sup> Bnr. “Rêziman”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, r. 29-30.

<sup>24</sup> Bnr. “Rêzimana kurdî”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 31.

<sup>25</sup> Bnr. “Rêzimana kurdî”, *Nûbihar*, h. 4, İstanbul 1993, r. 30.

<sup>26</sup> “Ferhengok”, *Nûbihar*, h. 1, İstanbul 1992, r. 32.

<sup>27</sup> “Ferhengok”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, r. 31-32.

<sup>28</sup> “Ferhengok”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 32.

<sup>29</sup> “Ferhenga kurdî-tirkî (1)”, *Nûbihar*, h. 4, İstanbul 1993, r. 31.

hatîye şopandin û wateya peyvên bîyanî/aloz ên di hejmarê bixwe da, di ferhengokeka biçûk da hatîye dayîn.<sup>30</sup>

### 3.4. Bêjeyên hevwater

Nivîsên *Nûbiharê* ji gelek alîyan ve wekî xezîneyeka zimanê kurdî tê hesibandin. Em dikarin bibêjin ku ev xebatên ku di kovarê da hatine weşandin dê ji bo îro û pêşeroja zimanê kurdî bibe tomarkirineka bêhempa û dê gelekî xebatên akademîk li ser van bînan kirin.<sup>31</sup> Wekî ku li jêr jî tê dîtin hin nivîskaran di nav nivîs, name, helbest û gotarên xwe da di nav kevanekê da hevmanaya peyvan jî dane:

*Bandûr-tesîr, jar-weza, renc-zehmet, mîzogerî-heqîqî, pişavtin-asîmîlasyon, bendetî-koletî, ferîşt-melek, birêzkar-hurmetkar, têvil-muxtelîf, diferimîne-ferman dike, yeksane-beramber, jar û qels, têkus û geş, jîna pêşîn-îbtîdaî, ol-dîn, himat-hol, pişe-sen'et, ji dil- ciddî, sosret-eceyîb, balind-teyr, diperwirînî-terbîye dikin, dabaş-behs, tentêl-hal, şehrez-medenî, zanoşgeh-zanîngeh-zango, saman-serwed, çavnebarî-hesûdî.<sup>32</sup> rewşenbîr û ronakbîr, evrenî-asyî<sup>33</sup> dilq-rol,<sup>34</sup> meze-te'm,<sup>35</sup> çiqil-dar, înkilabwarî-şoreşane,<sup>36</sup> role-nesîl,<sup>37</sup> dehbe-heywan,<sup>38</sup> taybetî-xusûsen, parzemîn-kit,<sup>39</sup> hiş-aqil, berfirehî-îhate, ne bes e-ne kafî ye, dûrî hiş- muhal,<sup>40</sup> pêwîstî-mecbûrîyet, bêdawîbûn-ebedîbûn, rastî-heqîqet, demîbûn-fanîbûn, pêwendî- îrtîbat, tebîet-xwezayî, şikeft-mixare,<sup>41</sup> hilnayê-bi cîh nabe, lêhatin-edilîn, bîyanî-xerîb,<sup>42</sup> li xarê-jêr.<sup>43</sup>*

<sup>30</sup> Wek mînak hejmar 5, 41 peyv; hejmar 6, 100 peyv; hejmar 7, 101 peyv; hejmar 8, 95 peyv; hejmar 9, 120 peyv; hejmar 10, 138 peyv; hejmar 11, 74 peyv; hejmar 12, 95 peyv.

<sup>31</sup> Heta îro li ser *Nûbiharê* hin xebatên akademîk hatine kirin. Yek ji van jî teza lîsansa bilind a Tûrkan Tosun e. Bnr. "Edebiyata Zarokan di Kovara *Nûbiharê* de (1992-2010), (Teza lîsansa bilind a çapnebûyî), Şêw: Mehmet Zahîr Ertekîn, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtûya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Bîngol 2017.

<sup>32</sup> Feqî Huseyn Sağniç, "Bandûra zmên li ser gel", *Nûbihar*, h. 20, İstanbul 1994, r. 15-16.

<sup>33</sup> Bekirhan Yıldız, "Name", *Nûbihar*, h. 20, İstanbul 1994, r. 22.

<sup>34</sup> Zeynelabidîn Zinar, "Amaca nivîsandinê", *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, r. 6.

<sup>35</sup> Zinar, heman gotar, r. 7.

<sup>36</sup> Newzat Nurullah Norşîn, "Nûbihar şeref û rûmet û serbilindiya me ye (Name)", *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, r. 20.

<sup>37</sup> Mihacir, heman gotar, h. 21, r. 28.

<sup>38</sup> Mihemed Diyaedîn Dağhan, "Jiyan û tesira ziman", *Nûbihar*, h. 22, İstanbul 1994, r. 14.

<sup>39</sup> Memê Alan, "Xwediyê Anatolîyayê kî ne?", *Nûbihar*, h. 23, İstanbul 1994, r. 5.

<sup>40</sup> Alî Karadenîz, "Hiş û rastî", *Nûbihar*, h. 23, İstanbul 1994, r. 19.

<sup>41</sup> Karadenîz, heman gotar, r. 20.

<sup>42</sup> İ. Omerî, "Zimanê kurdî û tîpên latînî", *Nûbihar*, h. 23, İstanbul 1994, r. 23.

<sup>43</sup> Omerî, heman gotar, r. 24.



### 3.5. Pêşbazîyên ziman

*Nûbihar* ji bo pêşvebirina zimanê kurdî û ji bo ku bala xwînerên xwe bikişîne li ser zimanî, hewldan û çalakîyên curbicur kirine. Yek ji van sazkirina pêşbazîyan e. Yek ji van pêşbazîyan jî ev e:

*“Hevalên hêja! Weke ku gerek e we jî texmîn kiribe, ev pêşbazî ji bona ku ji hevalan re bibe teşwîq, hatiye rêkxistin. Loma, em hêvî dikin ku, çi hevalên me yên ku hatine hilbijartin, çi yên ku nehatine hilbijartin, ji îro û pê ve serê xwe li ser zimanê me yê şîrîn zêdetir biêşînin û van astengên bêjimar ên li ber me û zimanê mê, ji holê rakin. Edî şikir ji Xweda re ku li vê parçeya Kurdistana me jî ev mudetek e zarokê bihêz ê bi navê zimanê kurdî rabûye ser piyê xwe.... Bi hêvîya ku em xortaniya wî, zewaca wî û zarokên wî (wek tarîx, edebîyat, civaknasî û hwd. bibînin û em bi wan şa bibin!”*<sup>44</sup>

*Nûbihar: “Hevalno! Me nêt kiriye ku em ji bona salvegera weşandina kovara me Nûbihar, pêşbaziyeke, yanê musabeqeke tertîb bikin. Mijar yanê mewzêya pêşbaziye, “Bikaranîna zimanê kurdî di weşanan û hemû aliyên jîyanê de, çi tesîrî li ser kurdan dike?” ye. ... Yên ku dixwazin têkevin vê pêşbaziye, lazime nivîsa xwe ya bi zimanê kurdî ya ku gereke ne zêdetirî sê rupelan (3 sehîfeyan) be û bi daktîlo hatibe tîprêzkirin... Di hewsengandina nivîsan da bi qasî mijarê, em ê uslûb, rêziman û edebîbûnê jî li ber çavan bigrin.”*<sup>45</sup>

*Pêşbazî: “Bi munasebeta salvegera yekemîn a kovara me Nûbihar, me pêşbaziyeke, yanê musabeqeke tertîb kiriye. Mijara vê pêşbaziye, “Bikaranîna zimanê kurdî di weşanan û hemû aliyên jîyanê de, çi tesîrî li ser kurdan dike?” ye.*<sup>46</sup>

### 3.6. Teşwîqkirina xwendin û nivîsandina bi kurdî

Ji bo ku pêvajoya hînbûnê dest pê bike divê eleqe û mereqa mirovan bi tiştên nedîyar û mechûl hebe. Herweha divê mirov giringî bi mijarên hînbûnê bide. Ji naverok, rêgez û prensîpên Kovara *Nûbiharê* jî xuya ye ku ev kovar ji roja derketîye heta vê demê, berê xwînerên û aboneyên xwe daye xwendin, hînbûn, hînkirin, nivîsîn û hwd. Di nivîsa “Destpêk”ê ya hejmara pêncan da ku yek ji hejmarên ewilîn e, edîtor dibêje *“Nezanî piştî me şikênandîye xuşk û birano! Gerek e em seferberîya zanabûn û rewşenbîrbûnê pêk bînin û vê seferberîye îlelebed bidomînin.”*<sup>47</sup> Bi rastî jî ev seferberî ji bo gelê kurd –her çiqas dereng

<sup>44</sup> *Nûbihar*, “Encama pêşbaziya me ya yekemîn a ‘bikaranîna zimanê kurdî....”, h. 19, İstanbul 1994, r. 3.

<sup>45</sup> “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 3.

<sup>46</sup> *Nûbihar*, h. 9, r. 8.

<sup>47</sup> “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 5, İstanbul 1993, r. 3.

mabe jî- divê wekî hewldaneka pîroz bê qebûlkerin. Mirov bi zanînê, bi xwendin û fikirînê mesûlîyeta xwe fam û îdrak dike.<sup>48</sup> Sabah kara di hin nivîsên xwe yên di *Nûbiharê* da weha dibêje: “*Mesûlîyet jî, kar û xebat teleb dike.*”<sup>49</sup> “*Naxwe sebeba esliya bindestiyê, nezanî ye.*”<sup>50</sup> “*Gelê me lazime çî bike bike û deriyê zanînê veke. Mîna ku Melayê Meşhûr dibêje: “Xwendin, xwendin, xwendin!”*”<sup>51</sup> Mebesta wî ji van gotinan ew e ku ku xwînerên xwe hişyar bike û berê wan bide xwendin û nivîsandina bi kurdî.

Kovar di nivîsên xwe da nezanîn û mexdûrîyeta kurdan dike û ji bo xelasîya wan şîreta xwendin û hînbûnê dike. “*Kurd di welatê xwe de mecbûrê jiyaneke jar û perîşan bûne. Ji mafên mirovahiyê nesîbê xwe nestandine û jiyana xwe bi esîrî û kolefî dom kirine.*”<sup>52</sup> “*Seyda Bediuzzeman Sêidê Norsî sê dijminan nîşanî me dîde: Yek nezanî ye, yek xizanî ye, yek jî îxtîlaf e. Li hemberê van her sê dijminan, sê sîlahê me yên ku em ê bi wan cîhadê bikin hene: yek huner e, yek zanîn e, yek jî îttîfaq e.*”<sup>53</sup> “*Roj li ber me rohnî bûye û roj roja dî rêya rast de meşandina ber bi zanebûn û hînbûnê ye. Lazime em li ser zimanê xwe bixebitin û bifikirin û edebiyat û çandêke Îslamî di zimanê xwe de bînin holê.*”<sup>54</sup>

Vê kovarê felsefeya jîyana Bediuzzeman a ku di gotina xwe ya dîrokî da dibêje ji xwe ra kirîye rêbaz û ew, bi vê prensîpê derketîye pêşîya mixatebên xwe: “*Ez bê nan dijîm lê bê azadî najîm.*” Nivîskarê kedkar ê kovarê Sabah Kara di nivîsa xwe ya bi navê “*Şerefa redkirina her tiştê ku mixalîfê azadîya me ye*” da di vî warî da çend gotinan dibêje ku ev gotin çarçoveya rengê kovarê derdixe holê: “*Lê belê azadî aslîterîn xusûsiyet e ku însan bi sayeta wê, dibe însan. Mirovê ku azadîya xwe ji dest dide, di heqîqetê de însanbûna xwe jî bi gelemperî ji dest dide.*”<sup>55</sup> “*Lazime em jibîr nekin ku însanbûna meriv, bi azadbûna wî ve bi şidayî girêdayî ye û em jibîr nekîn ku kesê ku ji azadîya xwe tewîz dide, di heqîqetê de ji însanîyet û şerefa xwe tawîz dide.*”<sup>56</sup>

Dema mirov ji alîyê rizîman, dengnasî, peyv sazî, hevoksazî, rastnivîsîn û hwd ve kurdî û erebî yan jî zimanekî din dide berhev mirov dibîne ku zimanê kurdî mixabin di hin qadan da hewcedarê bipêşvebirinê ye. Îro hê jî alfabeya kurdî birêkûpêk rûnenîştîye, hê jî rêzimana kurdî bi temamî nehatîye tespîtkirin, çanda kurdî ya nivîskî hê jî derneketîye qada weşanê.

<sup>48</sup> Kara, “Nezanî bindestiyê, zanîn rizgarî ye!”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, r. 5.

<sup>49</sup> Kara, heman gotar, r. 5.

<sup>50</sup> Kara, heman gotar, r. 5.

<sup>51</sup> Kara, heman gotar, r. 6.

<sup>52</sup> Süleyman Çevîk, “Nezanî bes e!”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, r. 19.

<sup>53</sup> Çevîk, heman gotar, r. 19.

<sup>54</sup> Çevîk, “Roj, roja zanebûn û hînbûna bi zimanê xwe ye”, r. 9.

<sup>55</sup> Kara, “Şerefa redkirina her tiştê ku mixalîfê azadîya me ye”, *Nûbihar*, h. 1, İstanbul 1992, r. 17.

<sup>56</sup> Kara, heman gotar, r. 18.

Divê gelekî xebat li ser vî zimanê bîn kirin. Kovara *Nûbiharê* xwe wekî berpirsîyareka vî karî dîtîye û hewleka mezin û giring daye ku kurdî ji vê rewşa xerab xilas bike.

Di nivîseka xwe ya ku di kovarê da hatîye weşandin da weha dibêje Zinar: “Nivîsandina bi kurdî; suxreyeke bi bêgavî ye, berpirsîyariyeke mirovatî ye û barê li ser piştê her kesê bîrewer e.”<sup>57</sup> Rişwanî jî gazî xwînerên kovarê dike û dibêje “*Ey xwendevanê Nûbiharê! Pir bixwînin.*”<sup>58</sup>

Kovar di hejmareka xwe ya di destpêkê de, di hejmara sisêyan da, ji xwînerê xwe yê ku nameya xwe bi tirkî nivîsîye ra weha dibêje: “*...Em ji bira İbrahim Xelîl rica dikin ku ji niha şûn ve nameyên xwe ne bi tirkî, bi kurdî binivîse.*”<sup>59</sup> Dîsa edîtorê kovarê di pêşgotina heman hejmarê da weha dibêje: “*Ev zimanê hêja li benda me ye ku em pê kitêbên ilmî binvîsin, em pê kitêbên edebî û hunerî binvîsin, em pê dilşa bibin û pê şînê bikşînin.*”<sup>60</sup> Em dibînin ji ku be di hemû destpêkên mijarên pêşî yê kovarê da edîtor û nivîskarên din berê kurdan didin nivîsandin û xwendina bi zimanê dayikê: “*Zimanê xwe hîn bibin. Bi zimanê xwe hîn bibin, bi axîfîn, bixwînin û binvîsin. ... Bi zimanê xwe evîna xwe, huzna xwe û derd û kulê xwe bînin zimên. Hûn ê bibînin ku zimanê we bi tenê, wê bikaribe van tiştan îfade bike. Lewra kokê vî zimanê di mêjî û rihê we de ne.*”<sup>61</sup>

Edîtor Kovara *Nûbiharê* ji bo zimanê kurdî wekî derfeteka giring dibîne. Ji alîyê din ve piçek jî berpirsîyariyê dide kurdan û ji wan ra weha dibêje: “*Ma gelo li ber vî halê ku em tê de ne, ti qebaheta me tineye? Ma me wezîfa xwe qenc pêk anîye? Vaye şikir ji Xweda re, kovar û kitêbên me diweşin. Lêbêlê ma em bi heddê kafî van kovar û kitêban dixwînin? Ma em kovar û kitêban didine xwendin? Erê gereke kurd nîşan bidin ku layiqê axaftin û xwendin û nivîsîna bi zimanê xwe ne.*”<sup>62</sup>

“*Dawî eve ku bêyî ziman ti tişt nabe. İnsan û civaka ku li zimanê xwe xwedî dernekeve û zimanê xwe bipêşda nabe, di heqîqetê de xwe mesix dike û xwe ji hole radike. Naxwe Kurdno! Li zimanê xwe xwedî derkevin. Lewra ko hûn li zimanê xwe xwedî dernekevin, hûn ê mesix bibin û ji holê rabin....*”<sup>63</sup>

<sup>57</sup> Zinar, “Amaca nivîsandinê”, r. 5.

<sup>58</sup> M. Heqqî Rişwanî, “Name”, *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 30.

<sup>59</sup> “Pêşgotin”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 3.

<sup>60</sup> “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 5, İstanbul 1993, r. 3.

<sup>61</sup> “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 3.

<sup>62</sup> “Pêşgotin”, *Nûbihar*, h. 10, İstanbul 1993, r. 3.

<sup>63</sup> Kara, “Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin!”, r. 6.

*“Han di vir de xwendin ji me re pir pêwîst e. Lazim e ku em pir bixwînin. Lewra xwendin ayeta Qur’anê ya pêşî ye. Xweda Teala pêşiya her tiştî, emrê xwendinê dike. Xwendin ji azadiyê pareke pir mezin e. Pêşveçûna mirovan bi xwendinê ye.”<sup>64</sup>*

#### 4. XWÎNER Û NÛBIHAR

##### 4.1. Hestên xwînerên Nûbiharê di nameyên wan da

Dema ku em li nameyên xwîner şopînerên Nûbiharê dinêrin, em bi hêsanî dibînin ku kelecaneke bê hempa di dilê wan da bi cih bûye. Hin ji wan bawer nakin ku kovareka bi vî rengî derdikeve, hin ji wan jî ditirsin ku rojek ev hewldana pîroz bi dawî bê. Ji ber vê yekê her daîm di nameyên xwe da ji bo berdewamîyê pişgirî didin û pişgirîya kesên din dixwazin. Kelecana wan di peyvên wan de, di hevokên wan da eşkere dibe:

*“Vê xizmeta we ya elzem e ku ne em tenê, belkê milyaketên ezman tebrîk û pîroz û çepik dikin. Bi vê xizmeta Nûbiharê serê mê li hember dost û dijminan hevraz û bilind e... Ez ji we rica û dexalet dikim, feryad û fixan dikim; Nûbihara ku ji me bêkesan re bû xwedî û hêvî û taqet, netemirînin.... Lewra Nûbihar şeref û rûmet û serbilindîya me ye...”<sup>65</sup>*

*“Nûbiharê, vê valahîya mezin bi alîkariya Xwedê dagirt û bû dermanê nexweşîya dilên bêhêvî. Ji ber vê em çiqas pesna vê kovara delal bidin jî hindik e...”<sup>66</sup>*

*“Ev kovara delal her çiqas dereng derketibe jî, valahiyeke pir mezin dagirtiye û gihîştîye hawara kurdan. Xwedê ji we razî be....”<sup>67</sup>*

*“Heta niha gelê kurd zimanê xwe, kultura xwe û edebiyata xwe gelek ji bîr kiribû. Bi zimanê kurdî rojname û kovareke ku pê zimanê xwe bielime û pê xweş gotinan bike tinebû. Lêbelê Kovara Nûbiharê vê pirsgirêkê ji holê rakir. Em pê zimanê xwe elimîn û em dikarin xweş gotinan pê bikin.”<sup>68</sup>*

*“Ev salek e we bi weşandîna kovara me ya Nûbiharê we heskirina me ya ji dil heq kiriye. Ji bo hezkirina me ji we re dom bîke şertekî me heye. Hûn Nûbihara me ne netefînin û hûn wê tim û tim weşînin... Peyva xwe ya paşîn de em dîsa wê xizmeta we yî ku derbas bûye jî dil ve pîroz dikin û domkirina weşandîna Nûbiharê jî ji we dixwazin.”<sup>69</sup>*

<sup>64</sup> M. Elî Ulu, “Pêşveçûn bi xwendin û desthevgirtin û xwe bi îslamê ve girêdanê ye”, *Nûbihar*, h. 10, İstanbul 1993, r. 24.

<sup>65</sup> Norşîn, heman gotar, r. 21.

<sup>66</sup> Celal Ceylan, “Nûbihar: dermanê nexweşîya dilên bêhêvî (Name)”, *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, r. 22.

<sup>67</sup> Ebdillah Azad, “Ji xebatkarên Nûbihar re (Name)”, *Nûbihar*, h. 18, İstanbul 1994, r. 31.

<sup>68</sup> Zeynelabidin Şivan, “Nûbihar, kovareke bêhemta ye (Name)”, *Nûbihar*, h. 13, İstanbul 1993, r. 29.

<sup>69</sup> Seîd Kuhrewî, “Nuhbihara me (Name)”, *Nûbihar*, h. 18, İstanbul 1993, r. 29.

Ji nameyên xwînerên kovarê, mirov bi hêsanî dikare hestên di navbera wan da tespît bike. Lewra xwîner bi rêya nameyan nêrîn, hest, rexne, bawerî, hêvî, daxwaz û rexneyên xwe bi hêsanî bi lêv kirine. Rexneyên xwîneran rexneyên avakar û erênî ne û ne yên xirabkar in. Ew carinan kovarê wekî mizgînîya biharê dibînin, carinan jî wekî perçeyek ji çareserîya pirsê ziman dibînin. Hin caran wekî meydana xweîfadekirinê dibînin hin caran jî wekî dermanê derdê xwe dibînin. *Nûbihar* jî bo hin kesan wekî xelateka giranbiha ye, ji bo hin kesan jî wekî dengê îslamê yê bi kurdî ye. Pêşkêşkirina çend mînakên din ji nêrîn, hest û ramanên xwîneran dê vê tespîtê berbiçav bike:

Huseyîn Gül: *“Zivistana kurdan de Nûbihar weka guleke biharê hate civatê... Em bi pirr armancên mezin li hêviya Nûbiharê bûn. Nûbihar li zivistanê guleke biharê ye. Ji bo paşerojê Nubahar mizgîniyeke mezine.”*<sup>70</sup>

Bavê Zeyd Azad: *“Ey gelî karbidestên Nûbiharê, we mizgîniyeke xweş û hêviyeke mezin da me gelî mezluman.”*<sup>71</sup>

Ebdilhelîm Yilmazer: *Nûbihar ji derdê me re bû derman.*<sup>72</sup>

Ehmed Doğan: *Ez nizamim bi çi kelîmê we pîroz bikim, ji bo vê xelata hêja û giranbiha, ji bo vê bihara ku we diyarî kurdên hejar kiriye. Xweda kulîlkên vê bahara salewest geştir bike.*<sup>73</sup>

Muhemmed Azadîxwaz: *Roja ku min Nûbihar dît, ez gelekî kêfxweş bûm. Ji ber kû min bi çavê xwe kovareke bi zimanê xwe û lo gora îslamiyetê dît, ez gelekî şa bûm.... Ez bawerim, ev xebata ku kovara Nûbiharê dike, gelekî mezin e. Lewra weke mamoste û seyda, dîn û ziman û gelê me li ber çavê me şêrîn dike.*<sup>74</sup>

Ahmet Dînc: *Berî her tiştî ez ê tebrîkê xwe ji we re bibêjim. Hun jî gereke bizanibin ku çavên melî riya we bû. Em li benda kovareke Îslamî ya Kurdî bûn û we jî ev pîrsgirêka me ya herî mezin ferisand.*<sup>75</sup>

Sumeyye Amed: *Bi rastî em bendewarê vê bûn. Me dixwest ku em çand û edebiyata xwe bielimin û bidin elimandin. Xweda ji we razî be. ... Ez xwendewara kovara Nûbiharê me û em*

<sup>70</sup> *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 28.

<sup>71</sup> *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 28.

<sup>72</sup> *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 8.

<sup>73</sup> *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 11.

<sup>74</sup> *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 13.

<sup>75</sup> *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 30.

*wisa dixwazîn ku hin bi hin bi zîmanê xwe pirtuk û kovaran bixwînîn û bi zîmanê xwe binivîsin.*<sup>76</sup>

Muhammed Elî Ulu: *Gelî karbidestên Nûbihar, ji we re gellek sipas dikim. We bi derxistina Nûbihar, em pîrr kêfxweş kirin. Kovara ku we derxistiye li gelê kurd pîroz be!.... Ev çend sedsalin zîmanê kurdan hatibû qedexekirin. Me pîrrî zîmanê xwe ji bîra kiri bu. Zîmanê me hatibû asimîlekirin. Lê Nûbihar ev tarîtiya li ser me bû, kir ronahî û di vî alî de, em hêvîdar kirin. Zanîna zîmanê me, armanca hemû xwendevanên Nûbihar e û ev armanca, armanca pîroz e.*<sup>77</sup>

M. Haqqî Rişwanî: *Kurd îro di welatê xwe de tete kuştin, koçber dibe. Çand û huner û edebiyata xwe jibîr kiriye; zîmanê wî hatiye qedexekirin. Xîzanî û nezanî pergala Kurdan belav kiriye. Ez ji we lava dikim. Bi xebatê xwe ji van kul û brîna re çaran bigerin û peyda bikin.*<sup>78</sup>

Behram Etmanî: *Ez li vê derê îtîraf dikim ku, aliyê zîmanê zîmakî û nivîsandinê de ez pîrr celeb im. Sedema vê jî aşîkar e. Bi sayeta Nûbiharê, ku Xwedê hez bike em ê kurdî hînbin û hê jî bi pêş de herin.*<sup>79</sup>

#### 4.2. Pêşniyazên xwînerên Nûbiharê

Em dibînin ku xwînerên Nûbiharê, kovarê wekî dibistanek, wekî malbatek û wekî stargehekê dibînin. Rexne dikin, pêşniyazan dikin, nivîs û helbestan dişînin, daxwazan dikin, xem û şahiyên xwe dişînin û telefonê dikin. Ji aliyê din ve em dibînin ku kovar jî xwînerên xwe wekî endamên malbata xwe dihesibîne û ji dil û can bersiva wan dide û gelek caran xwestekên wan pêk tîne: Hin pêşniyazên xwîner û bersîvên kovarê li jêrê hatine teqdîmkirin:

- Nûbihar: *“Piştî vê tenbîhê em dixazîn ku hinekî li ser qismek ji nameyên ku ji me re hatine bisekinin. Helbet îzah ne lazim e ku ji me re pîrr name û telefonên tebrîkê tîn. ... Lê em dê li vir li ser nameyên ku teklîf û rexne anîne hinek bisekinin. Amed Îbrahîm Xelîl Îpek dibêje ‘Xwendina kovarê li hevalan hinek zehmet tê. Zîmanê we mîna zîmanê kurdî yê 1914an ê Bedûzzeman e.’”*<sup>80</sup>

-Muhammed Elî Ulu: *“Aniha ez ê ji we çend tiştan bixwazim: Ez qaîl im ku hûn di kovara Nûbiharê de hinekî jî, ji tarîxa me binivîsin. Kalikên me, bi me bidin naskirin.*

<sup>76</sup> Nûbihar, h. 6, İstanbul 1993, r. 16.

<sup>77</sup> Nûbihar, h. 8, İstanbul 1993, r. 30.

<sup>78</sup> Nûbihar, h. 9, İstanbul 1993, r. 30.

<sup>79</sup> Nûbihar, h. 6, İstanbul 1993, r. 5.

<sup>80</sup> “Pêşgotin”, Nûbihar, h. 3, İstanbul 1993, r. 3.

*Daxweza min a din jî ev e; hûn ferhenga ku di kovara Nûbiharê de ye, hinekî zêde bikin, dê pîrr baş be.*<sup>81</sup>

- Ahmet Dînc: “*Ez ê li vir du sê rexneyên xwe bînim zimên. Ya pêşî ev e: Hun ferhegokê pîrr kurt diweşînin. Ko hûn ferhengokê zêdetir bikin wê zehf rind bibe. Lewra pîrr hevalên me yên xwendevanên kovara me, di vê pîrsgirêkê de diywariyê dikşînin û rexneyên xwe tînin zimên. Bi rastî, gellek bêjeyên ku di kovarê de tên weşandin, em jî mana wan nizanin. Ev jî ji bona xwendevanan tişteke xirab e. Rexneya duyemîn ev e: hûn di kovarê de cih nadin peyvên pêşîyan... Hal ev e ku em ji peyvên pêşîyan ti tiştê nizanin. Ev jî ne tişteke rind e. Ku hûn niv rûpelê an jî du sê setiran ji wan biweşînin, wê xweş be. Rexna min a sêyemîn ev e: Ku hûn di kovarê de rûpelek ji bona jiyanname û têkoşîna alimên me biweşînin, wê pîrr rind bibe.*”<sup>82</sup>

- M. Heqqî Rişwanî: “*Di Kovara Nûbiharê de ji bo dîroka Kurdîstanê rûpelekê vekin. Jiyanname û têkoşîna mezinên Kurdan binivîsin...Hûn Ferhengokê jî hinek zêde bikin, ez ê pîr şanaz bibim.*”<sup>83</sup>

- Celal Ceylan: *Hêviya me ji we ev e ku hûn bizanibin li devreyî welat jî kurd jiyana xwe didomînin. Gava ku hûn derheqê mijarên muxtelîf de biryaran distînin û difikirin, rewşa me jî bigirin li ber çavên xwe....*<sup>84</sup>

- Ebdillah Azad: “*Daxwazeke min ji we heye: Di kovarê de li ser dîrok û têkoşîna zanyar û mezinên kurdan heger hûn bisekinin ez ê gelek kêfxweş û memnûn bibim.*”<sup>85</sup>

### **4.3. Nîqaşên kovar û xwîneran di derheqê zimanî da**

Em ji pêşnîyaz û niqaşên xwînerên kovarê û ji bersivên kovarê dibînin ku her du alî jî wekî malbateka samîmî tevdigerin. Di hejmarên kovarê da gelek mînak hene ku vê rewşê li ber me şênber dikin:

*Nûbihar: “Ji Tetwanê, birayê me Reûf Çîçek, di nameya xwe ya sipehî de bi kurdî dibêje: “Gihîneka “weya” di kurdî de tineye. Ji dêwla “weya” bila “an jî” yan “yan jî” bê xebatkirin.” Kovar weha bersiv dide û dibêje: “Ma gelo “weya” malê tirka ye ku jê îstîfade bikin? Helbet na! Naxwe em dê çima ji vê bêjeya ku di nav gelê me de tê bi kar anîn, îstîfade nekin?”*<sup>86</sup>

<sup>81</sup> *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 30.

<sup>82</sup> *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 30.

<sup>83</sup> *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 30.

<sup>84</sup> Celal Ceylan, “Nûbihar: dermanê nexweşiya dilên bêhêvî (Name)”, *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, r. 22.

<sup>85</sup> Ebdillah Azad, “Ji xebatkarên Nûbihar re (Name)”, h. 18, İstanbul 1994, r. 31.

<sup>86</sup> “Pêşgotin”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 4.

Reûf Çîçek: *“Ko bêjeyên kurdî hebin, bila yên erebî yan tirkî neyên xebatkirin”.*  
Nûbihar: *Bira Rauf, me ji bêjeyên Tirkî eslen îstîfade nekiriye, lewra niyaza kurdî bi tirkî tineye, lê niyaza tirkî bi kurdî heye. .... Lêbelê erebî ne wisa ye. Erebi zimanê ola me ye, yanî malê mîrî ye û li her misilmanî helal e.*<sup>87</sup>

- Reûf Çîçek: *“Ko tîpên rûpela “Zarokname” hinek mezintir be, wê çêtir be.”* Nûbihar: *“Ev daxwaza birayê me maqul e.”*<sup>88</sup>

- Reûf Çîçek: *“Çend rûpel bila zazakî werin weşandin.”* Nûbihar: *“Me vê daxwaza brayê xwe di hejmarê duyemîn de anî cih û em dê dom bikin însaallah.”*<sup>89</sup>

- Ehmed Doğan: *“Nebî kovara hinek xwendevan û zana tenê. Bibî kovara hemu gelê Kurd. Hinek kovarên Kurdî hene, tu dibêjî qey bi zimanê Çînî hatine nivîsandin, yanê bi Kurdî ne, lê Kurd ji wan fêhm nakin.”*<sup>90</sup>

## 5. ENCAM

Me di vê lêkolînê da geştûgereka zimanî, çandî, dîrokî, civakî û psîkolojîk di nav rûpelên Kovara Nûbiharê da pêk anî. Li gorî tespîta me Nûbiharê hewl daye ku bi rengê xwe yê dînî zimanekî nîvmîrî ji mirinê xilas bike. Em nikarin bêjin ku bi tena serê xwe vê pêk anîye lê em dikarin bibêjin ku di vî warî da hewldana Nûbiharê hewldaneka pîroz û serkeftî ye. Wekî ku kovar û xwînerên wê bilêv dikin Nûbihar di demsala zivistanê da bûye bihara zimanê kurdî.

Em dibînin ku Kovara Nûbiharê di dirêjahîya bîst û neh salan da, di derheqê ziman û çanda kurdî da her çi heye qeyd kirîye û bûye wekî hafizeya gelekî. Em dikarên tê da ji ziman heta dînê, ji dîrokê heta erdnîgarîyê, ji çandê heta hunerê, ji pirtûkê heta çapemenîyê, ji civaknasîyê heta derûnnasîyê her tiştên ku bi kurdan ve têkildar in bibînin. Jixwe kovar xwe wekî parêzgeheka ziman, çand û nasnameya kurdan dihesibîne. Bi taybetî jî zimanê kurdî wekî nîşaneyê hebûna gelê kurd dibîne û wê nêrîna xwe derdixe pêş. Ji alîyê hiqûqa dinayê û dînê îslamê ve li mafê ziman û mirovan temaşe dike û parastina mafên kurdan dike.

Ji ber ku Nûbihar xwe wekî dibistana kurdî dibîne li ser ziman radiweste. Xwînerên xwe hînî alfabeyê dike, rêzimanê gav bi gav pêşkêş dike, ji bo peyvên bîyanî, aloz û zehmet ferheng amade dike, ji bo nivîsîn û xwendina bi kurdî pêşbazîyan amade dike û xwînerên xwe teşwîqê zimanê wan dike.

<sup>87</sup> “Pêşgotin”, Nûbihar, h. 3, r. 4.

<sup>88</sup> “Pêşgotin”, Nûbihar, h. 3, r. 4.

<sup>89</sup> “Pêşgotin”, Nûbihar, h. 3, r. 4.

<sup>90</sup> Nûbihar, h. 6, r. 11.



Çawa ku dixuye, *Nûbihar* di têkilîyên xwe yên ku bi xwîneran ra danîye da, gelekî serkeftî ye. Lewra em dibînin ku xwîner jî, kovarê wekî mîrasa xwe ya windabûyî dibînin û dema ku dibînin, wê dorpêç dikin û lê xwedî derdikevin. Kovara xwe rexne dikin, jê ra name û nivîs dişînin, jê daxwazan dikin, şîn û şahîyên xwe pê ra parve dikin û di her alîyê da pêşnîyazên pêşvebirina kovarê dikin. Kovar jî bi qadî îmkan û derfetên xwe daxwaz û xwestekên xwînerên xwe pêk tîne.

## 6. ÇAVKANÎ

- Alan**, Memê. “Xwediyê Anatoliyayê kî ne?”, *Nûbihar*, h. 23, İstanbul 1994, rr. 5-10.
- Amed**, Sumeyye. “Name”, *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 16.
- Azad**, Bavê Zeyd. “Name”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 28.
- Azad**, Ebdillah. “Ji xebatkarên Nûbihar re (Name),” h. 18, İstanbul 1994, r. 31.
- Azadîxwaz**, Muhemmed. “Name”, *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 13.
- Ceylan**, Celal. “Nûbihar: dermanê nexweşiya dilên bêhêvî (Name),” *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, r. 22.
- Çevik**, Süleyman. “Roj, roja zanebûn û hînbûna bi zimanê xwe ye”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, rr. 7-9.
- . “Li nav û dengê xwe xwedî derkevin”, *Nûbihar*, h. 13, İstanbul 1993, rr. 8-9.
- . “Nezanî bes e!”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, rr. 19-20.
- Dağhan**, Mihemed Diyaedîn. “Jiyan û tesira ziman”, *Nûbihar*, h. 22, İstanbul 1994, rr. 14-15.
- “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 4, İstanbul 1993, rr. 3-4.
- “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 5, İstanbul 1993, r. 3.
- “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 3.
- “Destpêk”, *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 3.
- Dînc**, Ahmet. “Name”, *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 30.
- Doğan**, Ehmed. “Name”, *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 11.
- Etmanî**, Behram. “Name”, *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 5.
- “Ferhenga kurdî-tirkî (1)”, *Nûbihar*, h. 4, İstanbul 1993, r. 31.
- “Ferhengok”, *Nûbihar*, h. 1, İstanbul 1992, r. 32.
- “Ferhengok”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, r. 31-32.
- “Ferhengok”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 32.
- Gül**, Huseyîn. “Name”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 28.
- Kara**, Sabah. “Şerefa redkirina her tiştê ku mixalifê azadîya me ye”, *Nûbihar*, h. 1, İstanbul 1992, rr. 17-18.

- . “Nezanî bindestiye, zanîn rizgarî ye!”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, rr. 5-7.
- . “Dar li ser kokê xwe hêşîn dibin, mirov li ser zimanê xwe!”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, rr. 5-6.
- . “Misilman gerek e muheqeq li pirsgirêka kurdan xwedî derkevin”, (Hevpeyvîna heftenameya Azadî), *Nûbihar*, h. 5, İstanbul 1993, rr. 23-29.
- Karadenîz**, Alî. “Hiş û rastî”, *Nûbihar*, h. 23, İstanbul 1994, rr. 19-21.
- Kuhrewî**, Seîd. “Nuhbihara me (Name)”, *Nûbihar*, h. 18, İstanbul 1994, r. 29.
- Mihacir**, Aqil. “Di serrastkirina rêya mirovan de rola zimanê zikmakî”, *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, rr. 27-29.
- Molazade**, İbrahîm Xelîl. “Ma İslam zimanê kurdî bipaşde xist?”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, rr. 11-12.
- Norşîn**, Newzat Nurullah. “Nûbihar şeref û rûmet û serbilindiya me ye (Name)”, *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1994, rr. 20-21.
- Nûbihar Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat (Nûbihar Kovara Çandî Hunerî Edebî)*, İstanbul 1993-2021.
- Nûbihar*, “Encama pêşbaziya me ya yekemîn a ‘bikaranîna zimanê kurdî...”, h. 19, İstanbul 1994, r. 3.
- Nûbihar*, “Ji çapemeniya kurdî, berpirsiyarê giştî yê kovara me Sabah Kara: “Heger ev ax, ne ax be, lê lat jî be, wê ev dara mezlûmiyetê, wê ev dara tûba, şîn were”, h. 14, İstanbul 1993, rr. 24-25.
- Omerî**, Î. “Zimanê kurdî û tîpên latînî”, *Nûbihar*, h. 23, İstanbul 1994, rr. 23-25.
- “Pêşgotin”, *Nûbihar*, h. 1, İstanbul 1992, rr. 3-4.
- “Pêşgotin”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1993, rr. 3-4.
- “Pêşgotin”, *Nûbihar*, h. 10, İstanbul 1993, r. 3.
- “Rêziman”, *Nûbihar*, h. 2, İstanbul 1992, rr. 29-30.
- “Rêzimana kurdî”, *Nûbihar*, h. 3, İstanbul 1992, r. 31.
- “Rêzimana kurdî”, *Nûbihar*, h. 4, İstanbul 1993, r. 30.
- Rişwanî**, M. Heqqî. “Name”, *Nûbihar*, h. 9, İstanbul 1993, r. 30.
- Sağniç**, Feqî Huseyn. “Bandûra zmên li ser gel”, *Nûbihar*, h. 20, İstanbul 1994, rr. 15-17.
- Şivan**, Zeynelabidîn. “Nûbihar, kovareke bêhemta ye (Name)”, *Nûbihar*, h. 13, İstanbul 1993, r. 29.
- Tosun**, Türkan. “Edebîyata Zarokan di Kovara Nûbiharê de (1992-2010), (Teza lîsansa bilind a çapnebûyî), Şew: Mehmet Zahîr Ertekîn, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtûya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Bîngol 2017.

**Ulu**, Muhammed Elî. “Name”, *Nûbihar*, h. 8, İstanbul 1993, r. 30.

------. “Pêşveçûn bi xwendin û desthevgirtin û xwe bi îslamê ve girêdanê ye”, *Nûbihar*, h. 10, İstanbul 1993, r. 24.

**Yildiz**, Bekirhan. “Name”, *Nûbihar*, h. 20, İstanbul 1994, r. 22.

**Yilmazer**, Ebdilhelîm. “Name”, *Nûbihar*, h. 6, İstanbul 1993, r. 8.

**Zinar**, Zeynelabidîn. “Amaca nivîsandinê”, *Nûbihar*, h. 21, İstanbul 1993, r. 5-7.